

## Kurdan Nikarîbû Helwesteke Kurdewarî Destnîşan Bikirna



Di sala 2007an da, rojêke ji rojên kela germa havîna Amedê bû. Nivîskar Recep Dildar telefon kir û got: “Nezir, em li cîkî runîştine, dostekî te li vir e ku ji zû de we hevdu nedîtiye.” Hê min ne got kî ye, berdevam kir: “Ger tu dixwazî wî bibinî were vira, em li benda te ne .”

Ciyê xwe ji min re tarîf kir û ez rabûm çûm. Li semta navdar a Amedê Ofîsê bûn. Çaxê ez giham ciyê ku ji min re terfîf kiribû, Recep li wir Li hêviya min bû. Ez birim malekê. Hermeteka por sor derî ji me re vekir. Recep em bi hevdu dan naskirin. Hermeta xwediya malê Suzan Samancı bû. Bi dilxweşî û bi rûkenî em dawetî hundirû kirin. Li hundir xanimêk û camêreki bedew runîştî bûn. Belê, min ew naskir. Ev camêrê bedew havalê min ê ku 30 sal berê me hevdu wîndî kiribû, Husên Düzen bû. Xanima runîştî jî Nedret Bilici bû. Min cara yekem ew li wir naskir.

Min û kak Husên di salên 1971-74 an da li navenda Mêrdînê hevdu naskiribû. Em wê çaxî şagirt bûn, xort bûn. Niha em herdu ji navsere bûne û porê me sipî bûye.

Piştî fasîla hevdu himbêzkirin û xêr hatinê em hêdî hêdî ketin nav sohbetê, lê zîlê derî lêxist. Mêvanê ku nu hat Îbrahîm Güçlü bû. Piştî ku Güçlü hat sohbet hê jî germtir bû. Nedret xanim pîr sohbet xweş û henekoyî bû. Me tevde xwarinên Suzan Xanim yê tehmîxweş xwarin. Sohbetêke gelek bi tam û şêrîn bû. Hê wî çaxî nîyeta min hebû ku wê tamê bi hevpeyvînekê dom bikim lê lihev nahat û fîrsat çênebû. Min hê nû fîrsat dît û ez bi kak Husên re li ser pîrsgirêkên nivîsar, wêje û zîmanê Kurdi sohbetê bikim. Fermo, ji kerema xwe re bixwînin. Ez hêvi dikim ku hûn jî tamê jê bistînin.

**Nezîrê Cibo:** Kak Husên, ez ne şaş bim, ez cenabê te ji sala 1975 an û vir de nasdikim. Bêguman di civaka nivîsarîyê de jî tu baş tê naskirin. Lê ez dîsa jî dixwazim ku tu ji bona xwendevanên Welatperwerê xwe bidî naskirin. Husên Düzen, çî çax û çawa ji Mêrdînê derket û çû Ewropayê?

**Husên Düzen:** Di destpêka salên 1970yê de min li Mêrdînê di dibistana navendî de dixwend. Hîngê tu di lîseyê de bû û li pansiyona dibîstanê dima. Di sala 1974an ez ji bo xwendinê çûm Amedê. Ez bawer im jê pê ve me hev nedît, heta ku berî bi du salan em li Amedê rastî hev hatin. Dawiya sala 1979 ez hatim Almanyayê. Hîngê şaredarê Amedê Mehdi Zana bû. Fransayê hinek Otoboz diyariyê şaredariya Amedê kiribûn. Ji bo wan bînin otobozek tije şîfêr ji Amedê çû Fransayê. Ez jî bi wan re heta Almanyayê hatim. Min li Almanyayê pêşî aborî xwend, pişre jî tib heta polê dawiyê. Niha jî bêtir ez bi wergerê mijûl im.

**Nezîrê Cibo:** Kak, Ev 30 sala tu li Ewropa dijî. Cara yekem tu kengî hat welêt nizanîm, lê ez dixwazim bipirsim, di vê pêvajoyê de li gora te, ji aliyê çand û jiyana civakî ve li kurdistanê te guhertineka çawa dît? Tiştê herî balkêş çi bû?

**Husên Düzen:** Piştî 5 salan ez sala 1985 vegeyriyam welêt. Tiştê ku niha tê bîra min, li her derê nalînek hebû. Ez li kê rast dihatim, bahsa salên dijwar yê dawiyê dikirin. Ji xwe gelek hevalên min nexuyabûn. Piraniya yê sax mayî derketibûn derveyî welêt. Gelekên ji wan jî di hebsê de bûn. Piştî ne her sal be, her ji du salan ez ji bo çend rojan diçim welêt. Bêguman gelek guhertin pêk hatin di van salan de. Ji ber ku dema ez ji welêt derketim, hişmendîya kurdewarî -bi taybetî di nav ciwanan de- zaf bilind bû, guhertinên ku piştî cuntaya leşkerî pêk hatin, tije nakokî bûn; ji hêlekê civak polîtîze bû, lê di heman demê de nîrxên netewî û yê partiyên siyasî tev li hev bûn. Berî ku ez derkevim, kesên xwende bêtir nêzikî pîrsgirêkên derdora xwe bûn. Herçû zanîna hizrî bêtir ji bo berjewendiyên şexsî hat bikaranîn. Rewşa komperest a siyaseta Kurdan jî rê li ber vê vekir. Berê îdfalên me hebû; guhertinên mezin bûn daxwazên me. Her çû berjewendiyên komên siyasî ketin pêş wan îdfalan.

**Nezîrê Cibo:** Bi taybetî ez dixwazim li ser pîrsgirêkên nivîsar û wêjeya kurdî pirsan ji te bikim. Lê di serî de ez nerînên te yê di derheqa babetêke rojevê, TRT6ê de meraq dikim. Gelo, tu TRT6ê çawa dibînî? Ji bo kurdan çi îfade dike, TRT6?

**Husên Düzen:** Navê wê yê fermî ne „TRT şeş“ e, „TRT altî“ ye. Berî bi çendakî koordînatore wê Sînan Îlhan, di programeke Kanal7 de got navê kanala ku bahs dibe, „TRT altî“ ye û ne „TRT şeş“ e. Bi min wisa tê ku bi zanebûn paşnavê „altî“ hat helbijartin (di destpêkê de TRT8 bû), ji bo ku bi hêsanî „alt“ angû „xwarê, bin“ bê bîra mirov ku bêtir li konseptê dewleta tirk tê. Van rojên dawî sererkanê ordûya tirk Îlker Başbuğ careke din vekirî hizrên dewletê yê ku li pişt vekirina TRT6 in, eşkere kirin û got tu mafên ku ew bidin Kurdan tune ne ji bilî „nasnameyêke xwarê“, angû „alt kimlik“.

Ji xwe di destpêka gotubêjên li ser TRT6 de -berî ku dest bi weşanê bike jî - min nerînên xwe di derbarê wê de gotibûn. Her wiha nivîsa min a herî dawî ya di Netkurdê de jî li ser vê babetê ye. Divê em baş bizanibin ku TRT6 televizyona dewletê ye. Piştî ku merov ev tesbît kir û pê ve divê merov dewleta tirk û nerînên wê yê li ser kurdan jî baş, lê birastî jî baş nasbike. Hingê nivê bersîva pîrsyara te derdikeve. Ev televizyon, ne di encama lihevkerîneke di nav Kurdan û dewletê de hatiye damezirandin. Dewletê ew ji bo berjewendiyên xwe û li gor qîma xwe damezirandîye. Ji xwe tu statuya wê î qanûnî jî tune ye, wek ku kek Fuad Önen di sohbetekê de ji min re gotibû, televizyoneke korsan e, TRT6.

Mixabin kurdan bi tevahî nikarîbûn helwesteke ku ji wan dihat xwestin destnîşan bikirna. Kesên mîna kek Îbrahim Güçlü jî ku ez nîrxekî mezin didim hizir û helewstên wî yê di gelek babetên din de, jî tevlê. Kek Brahîm jî ji dêvla ku li ser hizrên kurdewarî yê li ser vê babetê hûr bibe, wî ew mîna yê PKKê binavkirin û danîn aliyekî.

**Nezîrê Cibo:** Bêguman tu agahdar î, hunermenda kurd Rojîn di TRT6ê de dixebitî. Lê beriya niha bi çend rojan ji wezîfa xwe veqetîya an hat veqetandin. Çawa ku wezîfe wergirtina wê ya di TRT 6 de hatibû nîqaş kirin, veqetandina wê jî bû daneka nîqaşê û şîrovekirinê. Gelo di vê babetê de tu ê çi bibêjî?

**Husên Düzen:** Ez bawer im, ji ber ku programa wê hinek bal kişand ser xwe, dewletê ew ji kar avêt. Dibe ku sextin dijwar li ser wê ferz kiribin, ji bo ku ew derfetê bixe destê wan ku ji aliyê mafê kar derxistina wê ji wan re serêşanîne çêneke. Ji xwe hunermendeke ciwan e, Rojîn. Di peywendiyên wê û TRTê de eşkere bû ku ne xwedî helwest û azmûnên hunermendeke afrîner e. Wek gelek babetên din, hin nivîskar û alavên medyayê yê kurdan, ne xebata Rojîn a bi dewletê re, ne jî jikardexistina wê fam kirin. Ji dêvla ku li ser hûr bibin, wan li gor daxwazên xwe Rojînek ava kirin û yê ji wan re lazim ew bi ezmanan xistin yê ji wan re ne lazim jî ew di bin çêr û heqaretan de hiştin. Bi destûra te be, ez jî dixwazim êrîşên li ser kesatiya wê bi vê rêyê şermezar bikim. Lê bila xanima delal li min negre, min ne ji çîroka xwîna bi qula kilîta deriyê wê ve bawer kir, ne jî gotinên wê ku gotibû wê li ser pêşniyariya diya xwe dest bi karê TRT kir. Ji xwe wê jî di hevpeyvînekê de gotibû ku wê bi pêşniyariya Ümit Firat karê TRT pejirand. Zaf eşkere bû ku Rojîn, ne mîna hunermendeke kurd a xwedî helwest tevgeriya, belku mîna mamûrekê. Ji xwe hîn di destpêkê hin kesan belav kir ku xebata nivîskar an hunermendeke mîna Rojîn di TRT6ê de mîna ya mamûreke dewletê ye. Ez bi xwe ne di wê baweriyê de me ku naveroka xebata nivîskar an hunermendekî û mamûrekî bankayê mîna hev in. Divê Rojîn xanim jî berî ku dest bi karekî wisa bikira ev zanîba.

**Nezîrê Cibo:** Van rojan helwesta Kurdên li Swêdê ya di derbarê TRT6ê de tê nîqaş kirin, gelo bi çi rengî ye helwesta Kurdên Swêdê?

**Husên Düzen:** Têgeha “Kurdên Swêdê” di van 30 salên dawiyê de ji bo wêjeya kurdî xwedî nirxekî taybet e. Piştî cûntaya leşkerî li Turkiyê gelek Kurd çûn Swêdê. Piraniya wan kesên ku berî derketina ji welêt bi siyasetê mijûl bûn. Kêmezêde destên gelek ji wan hîngê jî pênuş digirt. Piştî ku li Swêdê bicîhbûn dest avêtin nivîsandina kurdî; gelek berhemên wêjeyî li Swêdê hatin nivîsandin. Ji ber ku di wan salan de rewş li welat xerab bû, xebatên li Swêdê nav û deng dan, lema têgeha “Ekola Swêdê” jî hat bikaranîn. Ne tenê ji ber hejmarê mezin a pirtûkên kurdî ku li Swêdê derketin, lê belê ji bo demokrasîya Kurdan jî hebûna komeke kurdên ku bi kurdî dinivîsandin û gelekên ji wan xwe ji bin bandora hizir û rêxistinên kurdan î fanatîk rizgar kiribûn jî girîng bû. Van neh deh salên dawiyê du guhertin bi hev re meşyan: Gelek ji wan kurdên Swêdê ku min bahsa wan kir, nikarîbûn xwe li gor şertan nuh bikin. Enerjiya wan kêmtir bû. Rêya ku biçin Turkî û vegerin ji wan re vebû. Di heman demê de li welêt gelek berhemên wêjeyî hatin nivîsandin, bi dehan nivîskarên nuh gihîştin, gelekên wan, kurdên ku li Swêdê dest bi nivîsandina kurdî kiribûn derbas kirin. Dibe ji ber ku hin malperên internetê yên kurdên Swêdê, pêşkêşîya pesinandina TRT6 di nav kurdan de kirin be, vê dema dawî wêneyekî kurdên swêdê î zaf negatîv derket holê. Ligel ku kesên xwedî helwest-mîna Hesenê Metê, Malmîsanîj, Reşo Zîlan- hebûn jî, gelek kesên ku min qet ji wan nedîpa, bi şeweyekî bê berpirsariyê û gelek caran bi peyvên alatewêş pesnê TRT6 dan. Hin nivîskarên, xwe ji bîr kirin ku ew nûnerê peyva nivîskî ne û ne yên medya dîtarfî. Kesên ku heta hîngê peyvek li ser tu medyên dezgehên kurdan nenivîsandibûn, bi dûvdirêjî li ser TRT6a dewletê methîye nivîsîn. Pîrr dem derbas nebû, gelekên ji wan mîna xebatkarên TRT6ê derketin pêşberî me.

**Nezîrê Cibo:** Di aliyê Zîmanê Kurdî de tu rewşa TRT6ê çawa dibînî? Di derheqa weşan û bernameyên wê de tu dikarî çi bibêjî?

**Husên Düzen:** Hem ji aliyê zimên hem jî ji aliyê naveroka programên ku pêşkêş dîke televîzyoneke kulek e. Ma heta niha te dîtiye ku tişteki ne resen, xweşik be. Li gel ku dewleta tirk û televîzyona wê TRT bi dehên salan weşanê dîke, ango xwedî azmûnên bi salan e jî, TRT6 heta niha li paş hemû televîzyonên Kurdan î heyî ye, ligel ku yên kurdan bi derfetên zaf bisînor kar dikin jî. Hin ji dublajên ku dikin, paqij in, lê belê gelekên ku li wan nayê guhdarî kirin jî hene. Her weha ger merov programekê yan duduwana jî nav wan derxe, programên ku çêdikin jî zaf lawaz in. Gelek caran ji aliyê hin kurdan jî ve hat gotin ku TRT6 li pêş hemû televîzyonên kurdan e, lê ev hizir ji rastiyê nayê. Bingehê vê hizrê jî j kesayetîya şikestî ya zarokên welatekî mêtîngêh tê. Wek mînak, ez dixwazim navê kekê xwe Ihsan Aksoy zikir bikim: Aksoyê ku di civatên ku ez bûme şahid hercarê civat bi henekên xwe li ser piştê dixistin, di programa ku niha ew di TRT6 de pêşkêş dîke de, mîna keke kurê welatekî mêtîngêh û şaşbûna wî di dezgehên dewleteke kolonyalist de dide.

**Nezîrê Cibo:** Her weki ku tê zanin li Kurdistanê azad zaravayê soranî mîna zîmanê fermî hat îlan kirin û zaravayê Kurmancî di qada perwerdetiyê de tê rakirin. Gelo tu di vê mijarê de çi difikrî?

**Husên Düzen:** Ez dizanim, wesiyeta nemir Melle Mistefa Barzanî ye, ku Soranî li başûrê Kurdistanê bibe zîmanê fermî. Bê rahmetî bi çi nêtê ev kir ez nizanim. Dibe ku di şertên hîngê de ji bo kurdên başûr û yekitiya wan girîng bû. Ez bi xwe dibêjim, bi êgir lîstin e ku merov Soranî derxe pêş û Kurmancî rake. Nêta wan çi dibe bila bibe, ev yek pêkanîna programa jî hev qetandina kurdan e.

**Nezîrê Cibo:** Her weki ku tu baş dizanî, di mesela zîman da lehçe ciyekî girîng digrin. Gelo di derheqa têkiliyên lehçeyên kurdî û xebatên li ser standarîzekirina zimên de tu çi difikrî? Mînak; tekîliyên soranî û kurmancî an kurmancî û zazakî...

**Husên Düzen:** Hebûna devokan, ango lehçeyan, dikare bibe dewlemendiyek jî û dikare bibe malxerabiyek jî. Qederê ez dibînim dê ji bo kurdan bibe malxerabiyek. Ger Kurdan bi siyaseteke netewî karîbûna tevbigeryana î pêwendiyên di nav lehçeyan de mîna danûstandinên pêkhatina neteweyekê bidîtana, dê hebûna gelek devokan bîba dewlemendî ji bo vê pêvajoyê. Qederê ez dibînim, ne li başûr ne jî li parçeyên din li gora siyaseteke netewî di vê babetê de nayê tevgerîn.

Di vi warî de nîqaşên zaf destruktîv ji hêla nivîskarên soran ve tên kirin, ku tîrsekê bi min re çêdikin. Tezên wan ji rastiya kurdan û hîmên zanistî bêtir li ser ezîtiya wan bi xwe tên avakirin. Wek mînak kesekî mîna □êrko Bêkes jî bêyî ku li ser encamê bihizire dibêje: "Zaraveyê ku bingeha wê ji aliyê Nalî, Salim û Kurdî ve hatiye danîn, jimareyeke mezin ji nivîskar û helbestvanên ji Rojhilata Kurdistanê û Başûrê Kurdistanê pê nivîsiye. Ez bi xwe wî zaraveyî dizanim û pêwîst e di paşerojê de her bi van pîtên xwe yên îro bibe zimanê standard yê kurdî ji bo hemû Kurdistanê." Belê, ji nuha ve kesên mîna wî dixwazin soranî "ji bo hemû Kurdistanê" ferz bikin. Ger rewş ev be tu rê li ber bi milyonan Kurdên kurmancî axêv namîne, ji xwe parastinê pê ve. Hîngê ji dêvla siyaseteke netewî dê yeke komparêzî çarenûsa zimanê kurdî destnîşan bike. Ger bi vî tehrî li ser vê yekê bê axaftin û jê jî xerabtir ku dersên mafê xwendina kurmancî neyê dan bo zarokên behdînî li axa azad, hîngê dê hoyên ku kurd ji hev cîhê bibin û ji dêvla neteweyekê du an jî zêdetir netewe bîr rojevê. Ez bawer im hîngê ew ê li ber bidestxistina mafê wan ê siyasî jî bibe astengeke zaf girîng.

**Nezîrê Cibo:** Kak Husên, nizanim bala te kişand an na, di Welatperwerê de li ser tîpên kurdi wek "î", "î" an "î" nîqaşek heye. Hinêk nivîsakarê malparê tîpa "î" bi kar tinin. Li ser vê yekê, beşek xwendevan û nivîskarên kurd em rexne kirin. Her wekî ku tê zanin QANATÊ KURDO , FEQE HÛSEYN , M.EMIN BOZASLAN û hinek zimannasên kurd tîpa "î" bi kar tinin. Di vê derheqê de tu çawa difikiri?

**Husên Düzen:** Ev nîqaşeke kevn e û gelek enerjîya kedkarên zimanê kurdî telef kiriye. Dema nîqaşa li ser vê babetê, ku mîna "babeta kumik" nav daye, derbas bûye. Niha kêmezêde zimanekî nivîsê ku bi tîpên latînî û li gor sîstema Mîr Celadet Bedîrxan tê nivîsandin heye. Bi sedan pirtûk hatine nivîsandin, gelek rojname û malperên înternetê pê tên weşandin. Ez bi xwe mîna piraniya kesên ku bi kurdî dinivîsin, tîpên "î" û "î" bikar tînim. Çiqas cûdatî pêk bîr, rûniştina zimanekî muşterek dijwartir dibe.

**Nezîrê Cibo:** Wekî ku ez zanim nivîskarên kurd yên li Evropa hemû li hemberî bikaranîna tîpa "î" yê ne. Lê yên li welêt bi piraniya vî tîpê bi kar tinin? Gelo çima?

**Husên Düzen:** Dibe ku merov, berî bi çend salan cûdayetiyêke wisa bikira. Qederê ez dibînim, niha piraniya nivîskarên li welêt û yên li derveyî welêt heman tîpan bikar tînin. Wek min li jor jî got, divê nîqaşên li ser vê babetê bi dawî bîr, ji ber ku lihevhatineke ku gelek kesan pejirandiye heye.

**Nezîrê Cibo:** Li gora te, îro pîrsgirêka nivîsar û wêjaya kurdî a herî girîng çî ye? Di derheqê rewşa wêjeya kurdî ya îro de bi kurtasî tu karî çî bêjî?

**Husên Düzen:** Wêje bi tevahî rengvedana civakê ye. Wêje wijdana mirovatîyê ye!, wek ku konferanseke seba 111 salî rojnamereyîya kurdî li Duhokê van rojan ji xwe re kir silogana sereke. Her weha rewşa wêjeya kurdî li gor rewşa tevahiya kurdan e. Bi min wisa tê ku pîrsgirêka herî mezin a civaka kurdan, û pê re jî a siyaseta wan kêmbûn an lawaziya takekesan e. Li civakên ku takekes kêr in pêşketin jî hêdî dimeşe. Îcar ku em vegehin ser pîrsyara te, divê em jibîr nekin ku wêje bixwe karekî takekesî ye. Ma bê takeksan afirandina berhemên wêjeyî dibe? Belkî tu bêjî belê dibe, qe nebe li ba kurdên bakûr. Belê ez jî li romanên ku bê nivîskar û mîna xebetake kollektîv hatine pêşkêşkirin rast hatime. Ez van tiştan dibêjim bêyî ku ez geşbûna wêjeya kurdî ya van bîst sih salên dawîyê nebînim. Bi taybetî li bakûrê welêt vê dema dawî gelek berhemên berbiçav deçûn.

**Nezîrê Cibo:** Di van rojên nêzik de Kurd ji hîlbijartineke girîng derketin. Tu encama helbijartina 29ê Adarê çawa dibîr?

**Husên Düzen:** Ecameke zaf balkêş derket holê. Berê jî min gotibû ku dê ev helbijartin ji bo bakûr bibe mîna referandûmekê. Û weha jî bû. Eşkere bû ku Kurd xwe wek neteweyekê cihê dibînin û ne tenê li dûv bidestxistina mafên rojane ne. Mafên kollektîv di ser mafên takekesane re digrin. Lê divê zaf vekirî bê gotin ku ev serkeftin ne ya partiyekê, ne jî ya îdeolojîyê ye. Ji xwe hin kesên ji DTP jî ev anîn zimên ku ne tenê hevalbendên wan ew helbijartin, herweha hemû kurdan helbijartina DTP mîna helwesteke netewî dîtin û wisa tevgeriyan.

**Nezîrê Cibo:** Gelo tu munasebeta encama vî helbijartinê û zimanê kurdî çawa şîrove dikî?

**Husên Düzen:** Ji bo zimanê kurdî jî zaf girîng bû ku partiyeke bi nasnameya kurdan ket helbijartinê û gelek deng wergirtin. Bi vî tehrî ji tevahiya dunyayê re hat gotin ku nîrxên netewî ji bo Kurdan di ser gelek tiştên din

re ne. Di dema helbijartinê de gelek gotûbêj li ser kanala TRT a dewletê ku dest bi weşana kurdî kir pêk hatin. Van nîqaşan rê li ber komparêziya teng a PKKê jî girtin û ew jî neçar ma ku daxwazên bi zimanê kurdî ve têkildar derxin pêş. Ez bawer im dê di vî warî de hew karibin gavan bi paş de bavêjin. Belkî xêra herî mezin a ku bi vekirina TRT6 re gihîşt kurdan jî ev bû. Ez qet bawer nakim ku PKK, ji niha pê ve wêrekiya ku tirkan an kesên tirkaxêv li ser kurdan ferz bike, ji bo ku bibin mebûs an jî şaredarê wan. Dibe ku demek bê dîsa li ser daxwaza Abdullah Öcalan tiştekî wisa hewl bidin jî, lê belê dê karê kesên wisa hew mîna berê hêsan be.

**Nezîrê Cibo:** Hevserokê DTPê Ahmet Türk roja 23ê Sibatê di civîna partiya xwe de li meclisa Tirkîyê bi kurdî axivî. Gelo ev axaftin û pê ve girêdayî helwesta DTPê gerek çawa bê şîrove kirin?

**Husên Düzen:** Axaftina Ahmet Türk, gaveke dîrokî bû. Tîrsa min ew e ku ne ew ne jî DTP nikaribe an nexwaze xwedî li wê helwestê derkeve, ji ber ku birêz Türk di warê bêtaetiya sivîl de ne xwedî azmûn e. Heta niha tiştên jê hatiye xwestin kiriye. Bi qasî ku DTP di helbijartina dawî de xwedî li nîrxên ku hebûna wê ji bo wan e, derket hîn tu carî derneketibû. Bêguman helwesta desthilatdariyê jî hişt ku ew bê ser vê xetê. Ez nabêjim tenê wê hişt, lê ew faktoreke girîng bû. Tê bîra min di sala 1991 rehmetyê Wedat Aydın jî helwesteke wisa esîl rêdabû, lê belê mixabin siyaseta kurd nikaribû ew bikira beşek ji xwe û pê kar bikira. Helwesta kurdên ji derveyê DTPê jî balkêş bû. Hin kesên ku zaf dûtî DTP bûn jî kirina birêz Ahmet Türk parastin. Yê ku ji guhê gê derneketin jî hebûn. Vê axaftinê li tevahiya dunyayê dengê erênî da. Piştî axaftinê bi saetekê min li rojnameyên Tirkan mêze kir, di malpera Milliyetê de dîsa Ümit Fîrat derket pêşberî min. Bi şeweyekî tund li dijî wê helwesta Ahmet Türk derdiket.

**Nezîrê Cibo:** Kak, ji kerema xwe re, tu ê karibî hinek bahsa xebatên di nav destên xwe de bikî.

**Husên Düzen:** Ji demêke dirêj de ye ez li ser wergera romeneke nivîskarê cihu-alman Joseph Roth dixebitim, berî bi çendakî qediya; Hinek xebata dawî jê re divê. Piştî min dil heye ku ez romana Herman Hesse “Gurên Qelaçan” ku min tebabek jê wergerandibû û nêvcî danîbû aliyekî biqedînim. Her weha van rojan ji min hat xwestin ku ez romaneke din wergerînim ser kurdî, ji ber ku min bi weşanxaneyê re hîn peyman dananiye, ez naxwazim niha qal bikim.

**Nezîrê Cibo:** Kak Husên, zor zor spas ji bona vê hevpeyvînê. Di xelasekê de tiştekî ku tu bêjî hebî, fermo.

**Husên Düzen:** Sipas xweş. Ez bi sohbeta bi te re zaf kêfxwêş bûm.

29.04.2009, Nezîrê Cibo